

Hêvî

Helbesta : Wefa Ebdulrezaq
Wergêran ji erebî: Îsmayil Tahir



Şihîna wê aryaye û çavên min xişêna bayine
Mîn hizir kir ev keibeya (hela) ye
Demê bêdengiyê mîna helametekî vedayî
Borê wê hilda
Ez çik girêdam û birîna min barand
Dehmenên wê bûne kêlbe
Mîn tama firîşteyiya giyanê wê seh kir
Û min gazî kir:
Mîn bi peçne
Bi peçne
Deh morik yê di gewiriya min de û xaçek
Mîn bo cem te wexer kir
Ebayê wê ji bîrkirinê nizanît
Sêva derazînkê û derzî ye
Ew hêviye
Dilê wê ji pîrbûna dilîniyê reş xuya bû
Axa wê gewir bû
Mîna wê pencer şewqê didet
Û mîna min..
Nuke dibirsqim da dest bikemê
Lê pehniya tiblên min direcifin
Hindî piştrast dibim dilvin narawestin
Ku çi hêvî nîne.

Li ser milê xwe
dizivirînim
Çend ji min dûr bikevît sîbera wê xwe di min wer diket
Heçku eza destîwîriyê ji lallekî werdigirim
Ewê minet heyî ku heta gorê dê
digel min bît

Min digot biyavê bayê azade
Payiza wî ya keftî
Û belg nekeftîne di sêniya fêqî da.

Demxweşiya digel wê ture kirim
(ehwalê şuma)
Ji hêstiriyê bê cilkirim
Hille, Ebu zebî, Lenden
Bi tinê ji wê nebît
Bê rê berev wê diçim
Ji ronahiya wê şermê dikem
Û xuh min didet
Pa tu bêjî (gotinbêrg) di çi hizir de ye?

Li ber dergehê xwedê digirît
Hêviyan jê diket
Dilîniyê bi her tarîstanekî bibet
Yê çi dergehên hêviyê nebin?.

** Hêvî navê xwişka helbestvane ku bi zimanê erebî dibe (reca).
Wefa Ebdulrizaq li sala 1959 li bajêrê Yesira li jêriya Îraqê hatiye ser
dunyayê û bawername bi zanistê jimêryarî heye. Niha li gel xêzana
xwe li Bîrîtanya dijî. Nasnavê Balyoza roşinbîriya zarokên bê
semyanên Îraqê li London "darxurma spî" wergirtiye û rêvebera
dezgehê dewletiyê xêrxwaz û mirovayê "darxurma spî" ye û
rêvebera bicihînanê û berpirsa peywendiyên derveya dezgehê
"uwir" yê serbixweyê roşinbîriya azade li Îraqê.

Wek Balwoza niyazên pak hatiye berbijarkirin bi dehan xelat û
bawername di hemû biyavan da wergirtîne wendame di bidexan
bizav, tevger, rêkxiraw, yane, yeketî, kubendan de li seranserî cîhanê
û bi sedan gotar û vekolîn di çapemenî yên îraqî û biyanî da belav
kirîne û yeke ji piştavan û alîkarên doza rewaya gelê kurd û
helwêstên baş dî biyavî da hene û "mîna ew dibêje "aşqa çiyayên
Kurdistanê ye."

Berhemên wê yên edebî bo bi dehan zimanan hatîne wergêran ji wan
"îngilîzî, firensî, îtalî, farisî, turkî û îspanî "hatîne wergêran, heta
nuke 6 dîwanên helbesta erebî û 3 dîwanên helbesta millî û 3 roman
û 3 "komelên çîrokê çap kirîne û 16 berhemên dî yên edebî û
roşinbîrî yên amade bo çapê hene.